



T ÊKOŞER



Hejmar 29

Îlon 1985



revue trimestrielle

driemaandelijks blad

TEKOŞER: KOVARA TEKOŞER, YEKÎTIYA KARKER û XWENDEKARÊN KURD LI BELÇIKA

NAVNIŞAN: B.P. 33 - 1730 ZELLIK - BELGIQUE

BUHA: 40 F.B., 2 DM, 6 FF.

N° BANKÊ: 426-3144071-85

K.B. - BELGIQUE

BERPIRSIYAR: M. Nezh YALÇIN

KOMÎTA NIVÎSKARIYÊ: Ahmed, Derwêş, Pervîn, Yalçin

T Ê D A Y Î

FAŞIST TÛRK CUNTASININ 5'INCI YILI	Derwêş	R. 3
RÊZIMANA KURDÎ	Celadet BEDIR XAN û R. LESCOT..	R. 4
HELBEST	Şahînê SOREKLÎ û BÊNAV	R. 7
DÎROKA KURDISTANÊ DI ANSİKLOPÊDIYA ISLAME DE		R. 9
STRAN	Cemîla celîL	R.12
WENE	Riza TOPAL	R.13
XEBATA ME		R.14
TEKOŞER'DEN HABERLER		R.15

FAŞİST TÜRK CUNTASININ 5'İNCİ YILI

Derwêş

5'nci yılına varan 12 Eylül faşist askeri darbesi Türkiye'nin politik, ekonomik ve sosyal yapısını değiştirmiş, uluslararası planda konumunu etkilemiştir. İnsan hakları tümünden çığnemiştir. Düşünce özgürlüğü, sendikal haklar ve örgütlenme hakkı yasaklandı. Cumhuriyetin kuruluşundan beri Kürt ulusu üzerinde sürdürülen baskı ve imha politikası yeni bir organizasyona büründürülmüş ve daha da hızlandırılmıştır.

Türkiye'de bugün ordunun yönetime katılması, anayasa ile kurumlaştırılmıştır. Türk ekonomisi Güney Amerika ve Uzakdoğu modeline uydurularak tamamıyla uluslararası finans çevrelerine bağlı kılınmıştır. Gelir dağılımı dünya ülkeleri arasındaki sıralamada en eşit siz olanlardan biri olmuştur. 12 Eylül öncesi dönemde Kürt sorununda parlamento ve siyasal partilerin de belli bir ağırlığı var iken, 12 Eylül ile birlikte çıkarılan yasalar ve anayasa ile ordunun bu konudaki tekelini iyice sağlamlaştırılmıştır.

Sıkıyönetimin İstanbul ve Adana dışında artık sadece Kürdistan'da devam ettirilmesi 12 Eylül'ün amaçlarını ortaya koyması bakımından ilginçtir. Öte yandan son bir yıldır cunta tanın askeri güçlerine ve işbirlikçilerine karşı yürütülen mücadeleyi bastırmak ayrıca tüm Kürt ulusunu yıldırım için yoğun bir baskı ve sindirme kampanyası yürütülmektedir. Binlerce Kürt köylüsü işkenceden geçirilmekte, hapse atılmakta, sayısı 10'u bulan bir çok köy ise boşaltılarak köy halkı zorunlu göçe tabi tutulmaktadır.

Türk ordusunun Kürdistan'da sık sık yaptığı tatbikatlarda ABD'nin Vietnam'da uyguladığı askeri pasifikasyon taktikleri denenmektedir. Tüm Kürdistan'da sivil halka karşı Kontrgerilla örgütlenmekte, bazı işbirlikçi unsurlar kendi halkına karşı silahlandırılmaktadır. Türk Milli İstihbarat Teşkilatı sivil

halkı ihbarcılık ya da ölüm şeklinde bir inkilap içinde bırakmaya çalışmaktadır. Hapishanelerdeki Kürt militanlar, yurtseverler ve aydınlar, özellikle Diyarbakır'da sistemli bir işkence altındadır.

Türk demokratik çevrelerinin ve geniş ölçüde Avrupa'daki demokratik çevrelerin Türkiye'de demokrasiye dönüş için sürdürdükleri kampanyada ulusal soruna yer vermemeleri düşündürücüdür. İnsan hak ve hürriyetlerinden bahsedenler Türkiye'de 60 yıldır "Kürt" kelimesinin bile yasak olduğunu hatırlarlarsa takipçisi oldukları "demokrasi"nin ne kadar sahte olduğunu görecektir. Demokrasi, askeri liderler ve onlarla aynı ırkçı-Kemalist ideolojiyi taşıyanlar arasındaki bir parlamentoluk oyunu değildir. Ordunun her zaman iktidara ortak olduğu, sadece kemalist ideolojinin içinde kalan sağ veya sol kanatlara özgürlük tanıdığı, ülke yönetiminin küçük bir azınlık tabakaya tapulandığı, bir ulusun ise kitlenin halinde köleleştirilip varlığının inkâr edildiği Türkiye'de her 10 yılda bir yapılan askeri darbelerle sürdürülen bu rejimin adı her şey olabilir, fakat demokrasi olamaz.

Türkiye'ye insan hakları konusunu incelemek üzere komisyon veya delegasyon göndermekten demokrasiye dönüş meselesini Türk devletinin temsilcileri ile tartışmaya yollayan bazı dünyasındaki bazı çevreler jeopolitik nedenlerle bu oyunun sürdürülmesine razı olabilirler, fakat inanıyoruz ki hümanist güçlerinde desteği ile Kürt ulusu bu oyunu bozacaktır.

Türkiye'de demokrasi ancak tüm halkların ve Kürt ulusunun tüm haklarının tanınması ile gerçekleşebilir. Bu olmaksızın geri kalanı aldatmacadır.

Şu veya bu fikri savunmak bir yana, Türkiye'de en basit özgürlük ancak Kemalist olmama özgürlüğüyle tanınabilir.

R Ê Z Î M A N A K U R D Î

Mîr Celadet BEDIR XAN û R. LESCOT (*)

(Zaravê Kurmancî)

- II -

B E Ş A Y E K E M Î N

A l f a b e û F o n ê t î k

I. A L F A B E Y A K U R D Î

1. Alfabeya kurdî ya bi tîpên latînfî alfabeye fonêtîk (1) e. Her yek ji tîpên ku wê ava dikin, ji xeynî cihêtiyên pîrr kêr, dengê sereke (bitenê) derdixîne, û meriv tucar nikare pê tîpekî din binivîse (ji xeynî du dengdêrên (tîpên bêdeng) ku bikaranîna wan ne icbarî ye. Li bend 5 binêre). Ango, hemî gotin li gora bilêvkirina wan, bê tereddudeke mimkin, tên nivîsîn; bi eynî awayî jî, di xwendinê de, hemî tîpên nivîsî divê ku bê bi lêv kirin.

2. Alfabeya kurdî ji 31 tîp hatiye ava kirin; 33, eger em du tîpên ku bikaranîna wan ne icbarî ye ragihînin wan (li bend 5 binêre): a, b, c, ç, d, e, ê, f, g, h, î, î, j, k, l, m, n, o, p, q, r, s, ş, t, u, û, v, w, x, y, z.

Di vî feslê yekemîn de, emê bitenê bi kurtî giranbuhayiya her yek ji wan nîşan bidin; fonêtîka kurdî ewê bi tefsîl di rûpelên paşîn de lê bê hûr nêrîn.

3. Di kurdî de heşt dengdêr (tîpên bideng) hene; sisê ji wan kin in û pênc dirêj in.

Dengdêrên kin. Jimara wan 3 ye: e, i, u. Hemî pêşîn yan tevlihev in.

E - Di navbera "ê" kî fransizî û "a" kî pîrr kin de ye. Meriv kare wî nêzîkî "a" yê ingilîzî yê "bad" bike.

Nîşe: dev, dest, der, ker, ser, ev, evor, vevejandin.

I - Weka I' yê tirkî ye, û bi fransizî jî

nêzîkî "e" yê bêdeng e. Ev "i" yekî kurt û pîrr hişk e. Meriv dengê nêzîkî wî di raderên almanî de dibîne: "Kommen, gehen, machen", ...

Nîşe: Kir, bir, mir, di, ji, li, dil, tevir, bivir, kirin.

U - weka dengê guhartî ku ji rasthatina nîvdengdêr "w" û dengdêr "i" pêk tê ye. Meriv dengê ewha di tu zimanekî ewrupî de nabîne: bitenê, meriv kare wî nêzîkî "u" yê kurt ê gotinên almanî "kurz, Kultur, Burg, kurdisch" bike. Di destnivîsên kevnên kurdî yê bi tîpên erebî de, ev deng bi "damma" kî hati bû nivîsîn.

Nîşe: Kur, gul, hundir, kun, kutilk, kulav, kumbir.

4. Dengdêrên dirêj. Bi kurdî, 5 dengdêrên dirêj hene: a, ê, î, o, û. ê, î pêşîn in; a, o, û paşîn in.

A - Nêzîkî "â" yê fransizî yê pîrr dirêj e, weka di gotina "âne" de.

Nîşe: bav, kal, mal, sar, av, ga, sal, savar, sahî.

Ê - Bi eynî awayê "é" yê fransizî (di gotina "été" de) derdikeve, lê pîrr dirêj tê bi lêv kirin.

Nîşe: Lê, kêl, têt, têt, mêt, hêv, hêk, mêtew, nêrîn, kêr.

I - Weka "i" yekî fransizî yekî pîrr dirêj e. Nîşe: Mîr, sîr, pîr, îro, îsal, spî, penîr, zînî, tîr.

(*) Grammaire Kurde, rûpel 3 - 7, Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris 1970.

Wergerandin: Fransizî-kurdî: Pervîn.

(1) Fonêtîk: Nivîsîna tîpan li gora dengên ku ji wan tên.

O - Weka "ô"yekî fransiziyekî cardin pîrr dirêj e.

Nîşe: Ol, pol, por, sol, sor, soz, kor, gol, torin, dorhêl.

Ū - Weka "ou"yê fransizî ye, lê cardin pîrr dirêj tê bi lêv kirin.

Nîşe: Dûr, mû, tûr, şûrik, rû, dûv, kûr, şalûl.

5. Dengdar. Rêzkirina wan a kurt ev e:

LÊVÎ (ên ku bi lêvan tên bi lêv kirin): b, f, m, p, v, w. Pêncên pêşîn buhayê wan eynî weka yê fransizî ye; w weka bi ingilîzî, di "well" de, tê bi lêv kirin.

Nîşe: War, were, wir, wî, winda, dewar, hewandin.

DIRANÎ (gava ku ziman xwe dispêre diranan): d, l, n, r, s, t, z. Hemî eynî dengên fransizî derdixînin, ji xeynî r ku weka bi ispanî û îtalî xurt e.

PEŞEZMANÎ (ên ku bi ezmanê dev tên bi lêv kirin: c, ç, ş, j, y.

C - "dj" tê bi lêv kirin, weka di "djinn" de.

Nîşe: Car, cil, cêrî, cisin, ciwan, can, cendek.

Ç - Bi fransizî kare "tch" bê nivîsîn, weka di "Tchecoslovaquie" de.

Nîşe: Çel, çilo, çûn, çol, çêkirin, çar, çep, çepçeqok.

J - Weka "j"yê fransizî ye.

Ş - Weka "ch"yê fransizî, di "chose" de, ye.

Nîşe: Şil, şûv, şev, şûr, şandin, şal, şapik, paşîv, şeveres.

Y - Buhayê wî yê niv-dengdêr e û hergav

weka bi fransizî, di "yeux" de, tê bi lêv kirin.

Nîşe: Yar, diyar, heyirîn, peyivîn, meyizîn, neyar.

EZMANÎ û QIRIKÎ (ên ku bi ezmanê dev û qirikê tên bi lêv kirin: g, h, k, q, x.

G - Hergav hişk e, weka, bi fransizî, di "garçon" de.

H - Bi nefes tê bi lêv kirin, weka bi almanî, di "haben" de; hergav bi eynî awayî tê bi lêv kirin, eger di destpêkê de be, yan jî di nivê gotinekê de bê dîtin.

Nîşe: Heyran, heval, cih, guh, qehirîn, bihêle.

K - Weka bi fransizî, di "kilogramme" de, tê bi lêv kirin.

Q - Dengdarekî kerr e. Dengê wî ji girtina qirikê û ezmanê dev, û paşê ji nişka ve ji vekirina wan, derdikeve. Ew di tu zimanekî ewrupî de tu neye. Q'yê kurdî weka q'yê erebî ye, lê jê nermtir e.

Nîşe: Qul, daleqandin, qedandin, qam, qenc, qehreman.

X - Weka yota ispanî, x'yê erebî yan "ch"yê almanî (di "suchen" de) ye. Ew pîrr caran tê pêşiya w. Wê çaxê, her du deng bi dengê tenê tên bi lêv kirin.

Nîşe: Xew, axa, axaftin, sernex, xwarin, xwe, xwêlî.

DENGDAËN KU BIKARANINA WAN NE ICBARÎ YE:

Baş e ku meriv du tîpên ku bikaranîna dengên wan ne giştî ye, lê ku bitenê di hin peyvikan de heye, ragihîne dengdarên ku hatin jimartin. Ev tîp ev in: h ku weka yê erebiyê pîrr xurt e, û X, weka yê erebî ye. Bikaranîna wan di nivîsînê de ne icbarî ye. Bi rastî, gotinên ku meriv tê de rastî wan tê hergav mimkin e ku bi h û x bên bi lêv kirin û nivîsîn.



A L F A B E Y A K U R D Î

TÎP	B U H A	N Î Ş E	BILÊVKIRINA MECAZÎ
a	â	Bav	Bâv
b	b	Bûn	Boun
c	dj	Car	Djâr
ç	tch	Çûn	Tchoune
d	d	dîn	Dîne
e	a'yê pirr kin	Dest	Dast
ê	é'yê pirr dirêj	Kêr	Kér
f	f	Firîn	Ferîne
g	g'yê hişk	Gol	Gôl
h	h'yê bi nefes	Hon	Hône
hî	h'yê pirr bi nefes	Hereket	Hharakat
i	e'yê almanî di "machen" de	Dil	Del
î	î'yê pirr dirêj	Iro	Îrô
j	j	Jar	Jâr
k	k	Kal	Kâl
l	l	Lal	Lâl
m	m	Mar	Mâr
n	n	Nan	Nâne
o	ô'yê pirr dirêj	Kon	Kône
p	p	Par	Pâr
q	q'yê erebî	Qam	Qâme
r	r'yê xurt	Rêl	Rél
s	s	Sol	Sôl
ş	ch'yê fransizî	Şîr	Chîr
t	t	Tehil	Tahel
u	koma "wi"	Kur	Kwer
û	ou'yê pirr dirêj	Şûr	Chour
v	v	Vên	Vén
w	w'yê ingilîzî	War	Ouâr
x	ch'yê almanî di "suchen" de	Xanî	Khânî
x̄	x̄'yê erebî, r'yê fransizî	Axa	Aghâ
y	y'ê fransizî di "yeux" de	Yar	Yâr
z	z	Zanîn	Zânîne

H e l b e s t

JI KÊ RE ?!

Ma ez ê ji kê re bixwînim helbestan,
bo kê binivîsim çîrok û qulwerkan?!
Wax; çîqa dilê min dixwaze
bo çê bikim lîstikan,
ken têxim ser lêvên zarokan,
hêstiran derxim ji çavên aşme nêzikan
lê qeram dikeve dilê min;
îşk dibin peyvok, nayên der
û pênuş di destê min de nalive
dema tê bîra min:
Mindalên me Kurdan
nedikanin bixwînin van nivîsan;
jin û peyayên me
nabînin van rûpelan.
Ronedîyo dilo,
de ezê ji kê re bixwînim helbestan,
bo kê tiji kim rûpelan?!
Ey welatê bê maf,
stana talihreşan,
Kurdistan !
Bêton kirin çavîyên çemên te
bo kesk nebin dar û ber,
vala bibin deşt û zozanên te
... û bi milyonan peyvokên zêrîn
di dilên nivîskar û helbestvanên te de
ber der kevin hatin fetisandin
bo şewqê nedin cîhanê.
Li ser kaş û çiyayên te,
di feyd û nawalan de
pêçîyan di çavên hev re dikin:
Şeva reş didomîne...
û ew dîwarê ji perdeyên reş
nahêle ku çirûskên peyvokan
tarîbûna şevan ron bikin.

Şahîne B. Soreklî (Sydney: 1985)

XWEZÎYA EZ MÛRÎYEK BA MA

Xwezîya ez cotkarek ba ma li dawîya dunê
yan gavanek ba ma li newalek dûr;
xwezîya ez nezaneke ba ma bê xem û bê derd
yan qeşmerek ba ma, ken bida zarokan;
xwezîya ez mûrîyek ba ma li mûristanek şên
yan mêşek hingiv ba ma, pîrr jîr û sivik!

Ez der ketim ji gund, gerîyam li welatan,
xwest bibim cîhanperwer, welat bîr bikim;
min dît jêr û jor, rohilat û roava;
wane bîst û yek sal li derve heliyan:
min bihîst û dît, nivîsand û xwend,
fêhm nakim çima sal bi sal dibim Kurd!

Kêf kêfa koran e, nabînin çî dibe;
dem dema kerran e, nabihîsin çî tê gotin;
xwelî l' serê wan be, yên rewşê fêhm dikan,
dizanin çî dibe li ser û hindir.
Hin dibên em mêr in, cîhan me nas dike,
hin jî bi girî û şîn ji doza xirab.

Ey bextereşên me, ax ji derdê we;
hûn dijîn di xewnan de, jîna we mirin;
Ey hawar ji derdê hin serokên me,
gavek wan li pêş lê du gav li paş;
Wey haho ji destê derewçînên me,
pîrr ziman dirêjin lê tune fayde.

Cinawirên çolan stendin mafên xwe;
em hîn ne dizanin em çî dixwazin.
Hin wane diçin ser hîv û stêrkan,
em hîn ne dizanin derdê me çî ye.
Kûçik û pisîk êdî tev dijîn,
em dijmin in bo hev, bêçare û nezan.

Dil tijî şewat bi şev û bi roj;
deng êdî nema ji bang û qîrîn
lê malxe pîrr in, kesek nabhîse;
sedsala bîstan waye tê dawî,
em negihîştin mal, rêwîyên bê kes:
De bigrî reben bigrî, sêwîyê xizan.
(xwezîya tu mûrîyek ba,
di mûristanek şên de).

BÊNAV: 1985

D Î R O K A K U R D Î S T A N Ê D Î

- II -

B. Dema îslamî heta 1920

Ji dema vegirtina (işgal) erebî, di destê me de zanînen bitefsîl li ser Kurdan hene. Di pênc sedsalên yekemînen Hicrî de, Kurd pîrr caran roleke giring di bûyerên ku carna ew dest bi wan dikin dilfzin. Gelek malbatên qraliyên kurd di vê demê de tên dîtin.

Xuyaye ku pêlên vegirtinên tirkî û mogolî Kurd di navbera sedsalên VIîn û Xîn de dan ji bîr kirin. Lê, di dema şerrên siltanên osmanî û şahên sefawî de, rewşeke baş ku Şerefname (1003/1596) wêneke wê ya rast nîşan dide, li Kurdistanê, ji bo pêşveçûna jîna fêodal çêdibe. Sînora tirkî-farisî hêdî hêdî di cihê xwe de dimîne, û Faris vedigerin piştî dîwarê Zagrosê û dirêjayiyên wî yên bakurî. Îcar Tirkîye dest bi karê hundurî yê xurtkirina hikmê navendî, di wilayetên rojhilatî de, dike. Di nêzîkî nivê sedsala XIXîn de, mîriyên kurdiyên dawîn li Tirkîyê (Hekkarî, Bidlîs, Suleymaniye) û li Farisistanê (Ardelan) hunda dibin. Lê, êlên (eşîr) mezin dijîn û çarçeva wan parastina unsurê kurdî, tevî xusûsiyetên wî yên civakî û etnikî, temîn dike. Farisistan hema tu têkiliya jîna hundurî ya êlên xwe yên kurdî nabe. Lê Tirkîye tecrube dike ku Kurdan weka pişt-girekî rêzanî (siyasî), ji bo hikmê navendî, bi kar bîne. Kurd carna xwe delalî dibînin û carna jî dijî hilweşandina bermayiyên otonomiya xwe ya kevn derdikevin. Gelek serhildanên kurdî di sedsala XIXîn de çêbûn, û, di destpêka sedsala XXîn de, tevgera kurdî jimara tevgerên netewî di Imperatoriya Osmanî de bêtir kir. Şoreşa 1908 Kurdan dikişîne jîna rêzanî: rojname, kovar û xelekên kurdî dest bi pîrrbûnê dibin. Di şerrê 1914-1918 de, navê Kurdistanê otonom, cara yekemîn, ji aliyê hêzan bi lêv dibe, lê ev plan bitenê bi awakî nivçe û ji bo erdên wilayeta kevn a Mûsilê ku girêdayî dewleta nuh a Iraqê bûn pêk tê.

KURD PIŞTÎ VEGIRTINA EREBÎ

Di destpêkê de, destkewt e (bifeyde ye) em zanînen ku em li ba nivîskarên ereb, li ser belavbûna êlên kurdî, dibînin bici-vînin.

Ji bo ku gotina Kurdistan berê dema Selçûkiyan ne hati bû nasîn, zanînen li ser Kurdan her gav ji aliyê Ereban, di bin bendên Zozan, Xilat, Ermenistan, Azarbaycan, Cibal, Faris û hwd... tên nîşan dan (li Driver, Dispersion of the Kurds in ancient times, di JRAS de, Cotmeh 1921, 563-72 binêre).

El-Mes'ûdî (332/943) û El-Istaxrî (340/951) ên pêşîn in ku li ser Kurdan zanînen muntezem didin. Di Murûc (III, 253-4 = & 1118) de, El-Mes'ûdî van êlan dijimêre: Li Dînawar û Hamadanê: Şuhcan; li Azarbaycanê: Hazbanî û Şurat = Xaricî (li jêr, li dîroka Daysam binêre); li Cibal: Şadancan, Lûr, Madancan, Mazdanakan, Barisan, Celalî, Caberkî, Cawanî, Mustakan; li Sûriyê: Dababile...; li Mûsil û Cûdî, Kurdên fîlle: Yakûbî û Curkan (Curuxan). Esera Tenbîh (88-91) a eynî nivîskarî bitenê Bazincan (li Istaxrî, 115 binêre), Neşawîre, Bûzîxan û Kîkan (îro, nêzîkî Maraş) radigihîne vê lîstê, lê ew lîsta Gundên ku tê de Kurd hebûn baş nîşan dide: Rumûmên (1) Farisistanê, Kirman, Sicistan, Xurasan (El-Istaxrî, 282: Gundekî kurdî di nahiya Asadabadê de), Isfahan (beşek ji êla Bazancan û bajarekî dewlemend bi navê Kurd, El-Yakûbî, 275, El-Istaxrî, 125), Cibal, bi hêzanî Mah El-Kûfa, Mah El-Basra, Mah Sabazan (Masabazan) û her du Ixar, ango Karac Ebî Dulaf û Burc, Hamadhan, Şahrîzûr tevî ragihanên wî Dara-bad û Şamxan (Zimkan), Azarbaycan, Ermenistan (li Dwin, li ser Aras, Kurd di xaniyên ji herî û kevir avabûyî de dijiyan, El-Muqeddesî, 277), Arran (yek ji deriyên Barda'a navê wî Bab El-Ekrad bû, û Miske-weyh te'kîd dike ku di dema vegirtina Orisan de, di 332/942 de, di bin emrê waliyê mehelli de Kurd hebûn), Baylakan, Bab El-Ebwab (Darbend), Cezîre, Sûriye û El-Suxûr (ango, xêza keleşan li aliyê Silîkya).

Bi hêzanî, li Farisistanê, El-Istaxrî, 98, navên 5 rumûman (li ser vê gotinê, li îlat binêre) dibêje. Her rem bajarê wî û serokê wî yê kurd ku berpîrsiyarê xarac (2) û emniyetê bû hebûn: 1- Ciloya,

(*) Encyclopédie de l'Islam, Parîs 1981. Wergerandin: Fransîzî-kurdî: Pervîn.

(1) Rumûm: yekejmara wê Rem e. Rêzayê (mana) vê gotinê bi farisî kerî yan kom e. Bi erebî rem navê navçeyên ku Kurd tê de rûdiniştin e.

AN S Î K L O P Ê D Î Y A İ S L A M Ê D E

(*)

ango Ramican, nêzîkî Isfahan û Xûzistanê. 2- Lawalican, di navbera Şîraz û Xelîcê Farisî de. 3- Dîwan, di Kûra Sabûr de. 4- Kariyan, ber bi Kirmanê. 5- Şahriyar ku li aliyê Isfahanê dirêj dibe û ku navekî wî yê din, Bazancan, heye, li gora êla mezintirîn ku beşeke wê li wilayeta Isfahanê hati bû bi cih kirin. Weka ragihana lîsta rumûman, El-Istaxrî, 114, lîsteke 33 êlên koçer (heyî, bi gelemjmar: ehya') ên Farisistanê, ku li ser zanînen Dîwan El-Sadaqa pêk bûye û ku ji aliyê Ibn Hewkel, çapa 2în, 270-1, wergerandina Kramers-Wiet, 267 û El-Muqeddesî, 446, ji nuh de çap bûye dide: Kirmanî, Ramanî, Mudessir, Muhemmed bin Bişr, Bakîlî (Muqeddesî: Çelêbî), Bundadmahrî, Muhemmed bin Ishaq, Sabahî, Ishaqî, Adharkanî, Şahrakî, Tahmadahnî, Zabadî, Şahrawî, Bundadakî, Xusrewî, Zencî, Safarî, Şahyarî, Mihrakî, Mubarekî, Istamharî, Şahûnî, Furatî, Salmûnî, Şîrî, Azaddoxtî, Barazdoxtî, Mutallabî, Mamalî, Şahkanî, Kactî, Celîlî; bi tevayî 500.000 malî ku di bin konê de dijîn.

Farisname (nêzîkî 500/1107) iddia dike (rûpel 168) ku Kurdên rumûmên mezinên kevn: Ciloya, Zîwan, Lawalican, Kariyan û Bazancan, ku unsurê mezintirîn ê leşkerê kevn ê Farisistanê ava dikir, hemî, ji xeynî yek - Alak - ku bû misilman û neslê xwe hişt, di şerrên destpêka islamê de mirin. Kurdine din, ji aliyê Ebd El-Dewle, ji aliyê Isfa-

hanê hatin anîn Farisistanê. Pejirandina (qebûlkirina) vemirandina 500.000 maliyên (?) kurd zor e, lê divê meriv imkana kombûna wan di nav êlên Farisistanê de û guhartina cinsiyeta wan bipejirîne. Remê kevn, Ciloya (Kûgalu), îro tê de Lûr rûdinên; em nizanin ji kînga ew li wira ne. Ji xeynî vava, lîsta El-Istaxrî êleke El-Lûrriye (bi navekî din: Lazba?) di nav Kurdên Farisistanê de nîşan dide. Ji alîkî din jî Farisname Kurdên malbatên Şabankara ku li Farisistanê, wê çaxê, pirr xurt bû bûn, Bûyidên dawîn, nîşan dide. Esera Mesalik El-Ebşar a El-Umerî li ser Şabankaran, di bin benedê xusîsî de dipeyve; û Şerefname wan di nav maliyên qraliyên kurd de dijmêre. Lê, yek ji malbatên mezin ên wan (Ramanî) navê êla "kurd" a El-Istaxrî distîne. Bi vî awayî, hertişt me dide bawer kirin ku "Kurdên" Farisistanê ji êlên Kurdistanê pirr cihê bûn (li Lûr, Şûl, binêre).

Gotina El-Zewzan (bi kurdî, Zozan) ku Kurdistanê navîn nîşan dide, ne baş vekirîye. Li gora Ibn Hewkel (çapa 2în, rûpel 348; wergerandina Kramers-Wiet, 342) qralê Zozan navê wî El-Deyranî bû (= Deranîk, qralê ermenî yê Vaspurakan). El-Muqeddesî (137) Zozan weka nahiyeye Cezîret Ibn Umar dihesibîne. Piştî wê, ji bo ku ev navçe gelha wê tevlihev -Kurd û Fillebû, fireh bû. Li gora Ibn El-Esîr (di Ya-



Abb. 24: Ein Hingling der Nizari-Kurden, Grob-iranischer Typus (Ph. A. v. 1.)



Abb. 25: Jung-Frau der Nizari-Kurden, Krieger-iranischer Typus (Phot. A. KUSCH) 10

(2) Xarac: Diravê ku fille diviyane bidin dewletê.

qût, II, 257 de), El-Zewzan bi mesafeta du rojan ji Mûsilê dest pê dikir û heta sînorên Xilatê dirêj dibû; ji aliyê Azarbaycanê, ew digihajt Salmasê. Tê de gelek kelehên Kurdên Başnawî û Bohtî hebûn: ên yekemîn, Berka, Beşîr (û Fanak) di destê wan de bûn; ji yê duymê re: Curzakîl (Gurgîl), navenda qralê wan, Atil (Şerefname, I, 117: Naş Atil?), Allûs, Baz El-Hamra bûn. Di dawiyê de, ji xwedyên Mûsilê re (Zangî): Alkî (=Elk), Arwax, Baxawxa (=Bekkûkî li Barwarî), Barxo, Kingawar (?), Nîrwa (li Rojhilata Akr?) û Xawsah bûn. Nivîsara Yaqût ne pirr emîn e; li gel vê qasê, dibe ku li vira behsa kelehên kurdî yê ku hêdî hêdî ji aliyê Hamadaniyan û Zagîdan hati bûn ragihandin tê kirin.


KURD DI BIN XELÎFE Û BOYIDAN DE


Ji demên pêşislamî, El-Mes'ûdî (Murûc, III, 250 = \$1113) urf û adetina li ser têkiliyên navbera mîrên ereb ên Xessan û Kurdan berhev kirin. Erebên islamkirî pêwendiyên xwe bi Kurdan re, piştî vegirtina Tekrît û Hulwanê di 16/637 de, kirin. Sa'd bin Ebî Weqqas ber bi Mûsilê ku tê de qezayên ku gelha wan kurd bû hati bûn vegirtin, çû (El-Merc, Ba-Nuhazra, Ba-Azra, Hibtûn, Dasin...; li Ibn El-Esîr, II, 408 binêre). Vegirtina navçê ji aliyê Iyad bin Xanm û Utba temam bû (El-Balazurî, Futûh, weşana De Goeje, 331). Patrikê Zozan, di 19/640 de, hikmê wê stend, li hemberî dana xaracê (Futûh, 176). Li Sûzyanê, Ereb, di 18/639 de, dijî Kurdên ku aliyê El-Hurmuzan, waliyê Faris ê Ehwazê, girti bûn derketin. (Ibn El-Esîr, II, 425). Li Farisistanê jî, Kurdan piştgirtiya Farisan di 23/642 de, kir, di dema parastina Fasa û Darabcirdê (eynî eser, III, 32). Dijî Kurdên Ehwazê, Umer diviya gelek vegirtinina bajo (Futûh, 382, 389; Ibn El-Esîr, III, 37). Ji alîkî din jî, di bin Umer de, Kurdan navçeyên Karxa navîn (Saymara, Masabazan) ku zimanê wan di dema El-Ya'qûbî de farisî ma bû vegirtin (BGA, VII, 236). Ereb, berê islamê, gihajti bûn Şahrezorê (Ibn El-Feqîh, 130), lê vegirtina dawîn a Şahrazor, Darabaz û Samxanê di 22/643 de xwîni bû (Futûh, 334; Ibn El-Esîr, III, 29). Li Başûrê, Ebû Mûsa El-Eş'erî, waliyê Basra, serhildanên kurdî li Bêrûz û Balascanê, di 25/645 de, pelixandin, lê Kurdan, bi zorê islamkirî, bi tevayî ola (dîn) xwe ya kevn berda (eynî eser, II, 66, 76). Di bin xilafeta Elî Ibn Ebî Talib de, Kurd, Faris û Fille beşdar bûn serhildana El-Xirrît, nêzîkî Ehwazê û li Farisistanê; lê ev serok li Rem-Hurmuzê şikiya (eynî eser, III, 309).

El-Muxtar ku, di bin xelîfê umewî Ebd El-Malik de, Ermenistan û Azarbaycanê stendi bûn, di 66/685 de waliyekî li Hulwanê te'yîn kir ji bo ku şerrê Kurdan bike (Ibn

El-Esîr, IV, 187), lê mirina El-Muxtar pêkanîna vê bernamê rawestand. Di bin eynî xelîfî de, Ibn El-Aş'asê serhil, di 83/702 de, bi Kurdên Sabûrê re, li Farisistanê, yek bû (eynî eser, IV, 352). Di 90/708 de, Kurdan Farisistanê talan kir û ji aliyê El-Heccac hatin pelixandin. Di 129/746 de, Kurdên Sabûrê dijî hevalbendê Xariciyan, Suleymanê ku dijî xelîfe Merwan II ser hilda bû û ku dora Sabûrê girti bû derketin (eynî eser, IV, 387, 341, V, 283). Merwan bixwe jî kurê cariyeye kurd (El-Tabarî, rêza IIIîn, I, 51) ku jê çavên şîn û rengê vekirî stendi bû, bû (W. Muir, The Caliphate, London 1891, 429).

Di bin xelîfê ebbasî El-Mensûr de, vegirtina Xazaran li Ermenistanê (147/764) bû sedema gelek serhildanan. Piştî çend salan, Kurd (intişar El-Ekrad) ji nuh de di babeta serhildana Mûsilê û gihajtina wê heta Hamadanê de (Ibn El-Esîr, V, 448, VI, 9) hatine nişan dan. Cafer, lawê El-Mensûr, ji cariyeye kurd bû (El-Tabarî, III, 442).





Übersichtsskizze 1: Die turano-pontischen Indogermanen in Vorderasien im 2. Jt. v. Chr.

Schraffiert: Kerngebiete der Hethiter, Mitanni, Urartu, Assyrer, Kassiten und Elamiter.

Abkürzungen: Aa = Alaca Hüyük, Ar = Alisar Hüyük, H-B = Hattuscha-Bogazköy, K = Karkemisch, Ker = Kermanschah, La = Lagasch, Mar = Maras, N = Niniveh, Q = Quadesch, TH = Tell Halaf, Z = Zencirli.

Di dema El-Mu'tasim de, serhildaneke kurdî di 225/839 de, hatiye nişan dan; ew di navçeya Mûsilê de, ji aliye Cafer bin Faharcis, kurê maliyeke esfleke kurd, hat dest pê kirin. Gava ku ew li Babaşêşê şikiya, Cafer xwe kişand çiyayê Dasinê û li wira dijî hêzên xelîfê rabû. Leşkerekî nuh ku ji aliye Aytaxê tirk hati bû ajotin, vê serhildanê rawestand (Ibn El-Esîr, VI, 360-1). Serhildaneke kurdî di 231/845 de, di navçeyên Isfahan, Cibal û Farisistanê de teqiya; lê ew pîr zû ji aliye generalên tirk Wasif hat pelixandin.

Kurdên Mûsilê, di 252/866 de, xwe gihandin Musawirê Xaricî ku bajêr stendi bû. Di 262/875 de, wan roleke giring di serhildana Zencan û ya Ya'qûb El-Saffar, avakerê qraliya Saffariyan, de lîzt. Ya'qûb li Ehwezê Kurdekî -Muhemmed bin Hazarmard-ku planên wî yê temahkar hebûn te'yîn kir. Wî pêwendiyar, bi dizî, bi serokê Zencan re kirin. Bi alîkariyên ku ji aliye evê dawîn hatin şandin, Muhemmed di ser Sûsê de çû, lê ji aliye Ehmed bin Laysûya hat vegerandin; evê dawîn, ku ew jî Kurd bû û serokê leşkerê kurd bû, ji aliye xelîfê hati bû

şandin ji bo pelixandina tevgera Ya'qûb (Ibn Xallikan, Wafayat, weşana Slane, IV, 304-8). Gava ku Ehmed çû, Muhemmed, tevî alîkariyên nuh ên serokê Zencan ku beşek ji wan kurd bû, Şustar stand û li wê derê, li gora lihevhatineke pêşîn, ew diviya xutbeke bi navê serhil bide kirin, lê ji nişka ve wî navê xelîfe El-Mu'temid û yê dijminê wî Ya'qûb El-Saffar îlan kirin. Hevalbendên Zenc Muhemmed berda û Şustar ji nuh de ji aliye Ibn Laysuya hat vegirtin. Muhemmed dûr çû Rem-Hurmuzê, lê ji wira jî, ji aliye kaptanên serokê Zencan hat qewirandin. Piştî zoriyên ku bi Kurdên Darnan re kişandin, Muhemmed ji nuh de alîkariya evê dawîn ku jê re hêzine ku Muhemmed avêtin nav şerr xwest; lê, ji nişka ve, wî ew berdan û êrişî wan kirin. Ji bo ku navbera wî û hevalbendê wî xera nebe, Muhemmed ta'yîna wî weka xelîfe pejirand. Mirina Ya'qûb (265/879) û serokê Zencan (270/883) ji hemî van maceran re dawî danî (Ibn El-Esîr, VII, 264).

Dûmahî heye



HERÊ, RÎNDÊ 42.

Allegretto

He - rê, rîn - dê, rîn - dê, rîn - da
min, Be - lê, rîn - dê, rîn - dê, rîn - da min.

Herê, rîndê, rîndê, rînda min.
Belê, rîndê, rîndê, rînda min.

Herê, wêda tê bi çawîşe,
Belê, wêda tê bi çawîşe.

Herê, ç'evê feş bexşîşe,
Belê, ç'evê feş bexşîşe.

Herê, rînda min t'ewnek danî.
Belê, dosta min t'ewnek danî.

Herê, nexşê ort'ê gul danî,
Belê, nexşê ort'ê gul danî.

Herê, navê min û xwe lê danî,
Belê, navê min û xwe lê danî.

Herê, rînda mine awazî.
Belê, dosta mine awazî.

Herê, te k'ofî barê gaki,
Belê, te k'ofî barê gaki.

Herê, k'ember barê peyakî,
Belê, k'ember barê peyakî.

Herê, tu ji malê meşa nakî,
Belê, tu ji malê meşa nakî,

Herê, tuê malê me xirabkî.
Belê, tuê malê me xirabkî.



Riza TOPAL - ein kurdischer Maler, Muzêya Bochum, 19.1. - 24.2.1980.

X E B A T A M E

9 HEZİRAN

Şeva BTIB (Yekîtiya Karkerên Tirkîyê li Belçîka) dijî nijadparêziyê. Em bi raxistina pirtûk, kaset û sîlikên kurdî beşdar bûn.

17 HEZİRAN

Civîna komela Sociale en Kulturele Raad bi komelên biyanî yê ku li şaredariya (belediye) St-Josse, li Bruxelles, dixebitin, ji bo danîna bingeheke hevrayî ku bibe gengaziya (wasite) pêwendiyên wan bi berpirsiyarên vê şaredariyê re.

13 TÎRMEH

Şeva Yekîtiya Xwendekarên Iraqî li Belçîka û Yekîtiya Xwendekar û Lawên Kurdistanê - Liqê Belçîka. Em bi raxistina pirtûk, kaset... ên kurdî beşdar bûn.

25 TÎRMEH

Merasîma mirina şoreşgerê kurd, Mustafa Remzî BUCAK, ku di 73 saliya xwe de li Parîsê wefat kir. Nûnerek ji Têkoşer beşdar bû vê merasîma ku ji aliyê Enstituya Kurdî hat amade kirin.

7 Îlon

Roja komela Lire et Ecrire "Xwendin û Nivîsandin" ku kampanyake mezin ji bo hînkirina zimanê fransîzî ji hemî kesên nexwenda re vekiriye. Gelek komelên belçîkî û biyanî bi raxistin, filmên vidêo, komên muzîkê.... beşdar bû bûn. Me jî filma Şivan "Kîne Em?" nîşan da û pirtûkên kurdî raxistin.

* * * *

RADYOYA AZAD

Weşana kurdî, her yekşem, seet 13-15, FM 104.1, di hemî Bruxelles û şaredariyên dora wê de tê guhdarî kirin. Em vê weşanê, bi 4 zimanan pêşkêş dikin û tê de nûçeyên nuh, dîroka Kurdistanê û muzîk û stranên kurdî didin nasîn.

* * * *

BERHEVKIRINA DOKUMANAN LI SER KURDAN

- Dictionnaire Kurde-Français, Auguste Jaba, Biblio verlag - Osnabruch - 1975 (çapa nuh a 1879).
- Kurdische Grammatik, Fernand Justi, 1983 (çapa nuh a 1880)

- Kurdisch-Persische Forschungen, Oskar Mann, Band I, Berlin und Leipzig 1926; Abteilung I, III, IV, Berlin 1906, 1909, 1930, 1932.
- Grammaire Kurde, Abbé Paul BEIDAR, Librairie Orientaliste Paul Geutner, 1926.
- The Kurds in Iran, Wolfgang Behn, London 1977.
- Kurdistan and the Kurds, Abdul Rahman Qasimlû, Prague 1965.

Bi erebî

- Nasandina Dîwanê Melleyê Cezîrî, Ehmed Bin Melle Mihemmedê Zefnegî, miftiyê Qamişlî, Qamişlî 1985.
- Wergerandina Şerefname ya Şerefxanê Bedlîsî (farisî-erebî), Mihemmed Elî Ewnî, 1948.
- Wergerandina Dîroka Dewlet û Mîriyên Kurdî di Dema Islami de, ya Mihemmed Emîn Zekî (kurdî-erebî), Mihemmed Elî Ewnî, wergeran li dîwanê Qralê Misrê, 1945.
- Pirsra kurdî û netewa erebî di şerrê Iraqê de, Mehmûd El-Durre, Beyrût 1963.
- Wergerandina "Vejiyana Kurdan a Çandî û Netewî. Dawiya sedsala XIXîn, Destpêka sedsala XXîn" a Celîlê Celîl. Wergeran: Bavê Nazê, D. Welato, Keder, 1984.
- Wergerandina Mem û Zîn a Ehmedê Xanî, Dr. Muhemmed Seîd Remezane Botî, Weşana Dar El-Fikr, Şam 1982.
- Wergerandina romana Yilmaz Guney "Salpa", Fadîl Cotkar, weşana El-Mektebe El-Hedîse, Şam (tarîxa romanê "Girtîgeha Selîmiye, 1973". Tarîxa wergerandinê tu neye).

Bi farisî

- Tarîxî Merdûx, Şêx Mihemmed Merdûxê Kurdistanî (di dema Şahê Iranê de. Bê tarîx e).

* * * *

FILMÊN VIDEO

- Newroza Şamê, 1985
- Newroza Qamişlî, 1984
- Newroza Heleb-Ifrîn, 1984
- Şeva Mihemmed Arif Cezrawî

* * * *

K A S E T

- İsa Berwarî - Eyşe Şan - Arif Cezrawî
- İsa Berwarî & Hesên Xulam
- "Zeydan" Gorî
- Dilşad "kemençe, Nergiz", 2, 3
- Seîd Yusif, 1984, 1985
- Xidir Omerî
- Xidir Omerî - Kizil Tepe - Elî Ehmed
- Tehsîn Taha
- Adil Huznî

- İbrahim Mercî
- Erdewan
- Mihemmed Şêxo, 1985
- Mihemmed Şêxo, İran
- Koma Newroz
- Koma Narîn
- Eyas Yûsif Zaxolî
- Selah Resûl
- Gara, 1985

T Ê K O Ş E R ' D E N H A B E R L E R

9 Haziran : BTİB (Belçika'da Türkiye' li işçiler Birliği) nin ırkçılığa karşı gecesi: kitap, müzik kasetleri ve plakları sergisi ile katıldık.

17 Haziran : Sociale en Kulturele Raad' ın St.-Josse (Brüksel) belediyesi'ne ait bölgede çalışan örgütlerle toplantısı. Toplantının amacı belediye sorumluları ile ilişkilerin sağlanmasını öngören bir platformun oluşturulmasıydı.

13 Temmuz : Avrupa'da Kürdistan'lı Öğrenci ve Gençlik Birliği-Belçika Şubesi ve Iraklı Öğrenciler Birliği'nin gecesi: kitap, müzik kasetleri ve plak sergimiz ile katıldık.

25 Temmuz: Değerli Kürt yurtseveri eski senatör-avukat, Mustafa Remzi Bucak' ın, Paris'te Kürt Enstitüsü tarafından düzenlenen merasim törenine bir temsilci ile katıldık.

7 Eylül : Fransızca bilmeyenlere Fransızca öğretme kampanyasını açan "Lire et Ec-rire" (okuma ve yazma) örgütünün günü. Birçok Belçika ve göçmenlerin örgütleri, video filmleri ve müzik grupları ile katıldılar. Biz'de Şivan Perwer'ın "Kî ne em?" video filmi ve kitep sergimiz ile katıldık.

7 Eylül : Paris Kürt Enstitüsü'nün Paris'te düzenlediği "Yılmaz Güney'i Anma Gecesi"ne Tekoşer iki temsilci ile katıldı

Serbest Radyo : Her pazar, saat 13-15 arası, FM 104.1 üzeri tüm Brüksel ve çevresi için yayın yapan Kürtçe programımız var. Biz bu yayını, 4 dildi yaparak, önemli haberleri, Kürdistan tarihini, müzik ve halk hikayelerini dinleyicilere sunuyoruz.

KÜRTLER İLE İLGİLİ BELGELERİN TOPLANMASI: (sayfa 14.15 bakınız)



Handwritten text in Persian script, likely a signature or a note, located in the bottom right corner of the photograph. The text is written in dark ink and appears to be a name followed by a date or a location, though it is difficult to read precisely due to the cursive style and some fading.